# Şer di pêxema xwe dorandinê de

Ev rastiye nahê veşartin ku rejîma Îslamî ya Îranê ne di ware teknolojiya şer de û ne di ware sîstema siyasî û civakî de, xwediyê çî hevsengiyekê li beramber Îsrayîlê de nine.

dom»R:10



# KÊŞEYA CIVAKA ROJHELATA NAVÎN Û RIYA ÇARESERÎYÊ

Li ser civak û dîroka rojhelata navîn gelek analîz û lêkolîn hene. Hema bêje exlebên van analiz û lêkolînan di warê ne demokratîkbûnî û pergalên sazimanîya dewlet û civakê de ne. Bi awayekî encamname derdikevin pêş.

dom» R:9

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (468) 21-04-2024 Buha (1000) Tûmen*

# Sê awayên nakokî û pevçûnan

Hêgêl dibêje ku di navbera hikûmetan de, dema wîst û daxwazên diyar nekarin bingeheke hevpar peyda bikin, dibin sedema derketina şer. Rastiya wê yekê di şer û pevçûnên navbera Îran û Îsraîlê de xwe da eyankirin.

dom» R:4

# Ev Şere, yan jî maşkanê û xapandina raya giştiye?

Îsraîlê Roja 1ê Nîsanê êriş kire ser Konsulxaneya Îranê ya li Şamê, di vê êrişê de ji hêzên ewlehiyê yên Îranê 7 pastar û pilebilindên leşkerî hatne kuştin.

Ev yêkim car bû ku Îsraîl bi aşkera û rasterast êrîşekî bi wî awayî bike ser rêjîma îranê ku axa balyozxane û kunsulxaneyên her welatekî li welatekî din de, bi axa wî welatî anku xwediyê balyozxanê tête hisabê.

Rêjîma Îranê ku gelek caran derbên mezin ji Îsraîl xwarinê, lê qet çavnihêriya êrîşekî wiha rasterast nedikir, lewra kevte nav anal û bizmaran û ji aliyekê kevte jêr givaşa alîgirên xwe yên tundajo li nava rêjîmê de ku dive tolê bistîne, ji aliyekî dine jî baş dizanî ku ger êrîşekî bike ser Îsraîl, êdî renge her wisa bi sanahî ji vê qopiyê xelas nebe û renge rastî şerekî kavilker û berteka Îsraîl bibe ku ev jî dê bibe sedemê herifîna stûnên wê yên rizî.
Deshilatdarên rêjîmê û serweyî hemiyan Elî Xamineyî û piledarên sipaha terrorist, bi armanca razîkirin û têr kirina alîgirên hizra tolhildanê, di heyamê nêzî 15 rojan pirûpagende kirin ku div Îsraîl bête tembîkirin.

Hevdem digel vê pirûpagenda xapandina alîgirên xwe, kevtne nava danûstandina û pêywendiya digel welatan û bi taybetî Amerîka ku hewceye bi armanca razîkirina hizra tundajoye navxweyî dive em sinaryoyekî êrîşkirinê encamp bidin û bikarin abûr û hetka çoyî heya qasekê box we bikirin.

Belê herwerk rêkevtina dema êrîşa rêjîmê bo ser Eynûl Esedê di gel Amerîka û agehdarkirin û çolkirina wî binkeyî ji aliyê Amerîka ve heta ku xisra negeheîje hêzên Amerîka, wê care jî 15 rojan ser hev kevte dîplomasiyê ku Amerîka û Rojava bila Îsraîl razî bikin ku îzna êrîşekê bide min ku encamp bidim, gorî gotina Wezîrê derwe



yê rêjîmê, soz dabû Amerîka ku ev êrîşa dê sinûrdar û bê xisar be bo Îsraîl.
Lê dîsan kum ço serê rêjîma Îranê û bi êrîşekî sedan mûşekî û dironî bo ser Îsraîl zêdetir li qopiyê de bat bû, Îsraîl jî bona parastina hetka xwe û nîşandana hêza xwe, êrîş kire ser binkên serbaziye rêjîmê li parêzgeha Îsfehanê.

Gelo ev şer dê ber bi kîve biçe û encamp dê çi be, û dê çi guhertinan pêk bîne, gelek zûye ku mirov bersivê wergire.

# Peyama Navenda Birêveberiya pdki, bi hilkefta salvegera avakirina yekemîn rêkxistina ciwanên Kurd

Li 22ê Xakelêweya îsal, 81 sal ji avakirina yekemîn rêkxistia ciwanên Kurd re derbas dibe. Li vê serdemê de refek ji ciwanên Kurd bi hizra netewî û welatparêzî û li jêr sîbera Komeleya Jiyaneweya Kurd de biryar dan ku li pêxema rêkxistin û perwerdeya netewiya ciwanan, xebata xwe li jêr navê “Sazmana Cewanên Kurd” destpê bikin û nerîta karê bi kom û rêkxiraveyî bihêztir bikin. Her lewma, em vê roja dîrokî li hemû ciwanên Kurd pîroz dikin û hivîdar in, Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê micidtir ji berê bo xizmet bi ciwanên Kurd tekoşînê bikin.

dom» R:2

# Rêzdar Xalid Ezîzî: “Felsefetya xebata Çekdariya me bo berevanî li xwe bûye”

Rêzdar Xalid Ezîzî, Berdevkê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li hevpeyvînekê de digel “Deutsche Welle” yê de li 18ê Xakelêweya îsal de li derheq givaşên dewleta Îraqê û Herêma Kurdistanê bo ser Hizba Dêmokrat li heyama derbasbûyî de îşare bi vê yekê kir ku li vê pirsa ewlehî de ku rêjîma Îranê jî pêdagirî li ser dikir, daxwaz ji hikûmeta Îraqê kiriye ku hêzên Hizba Dêmokrat axa Îraqê bo êrîşkirin bo ser hêzên Komara Îslamiya Îranê li Kurdistana Îranê, bi kar neyînin. Me li heyama çend salên derbasbûyî de ew yeka nekiriye.

dom» R:3

# Peyama Navenda Birêveberiya Giştî a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta salvegera avakirina yekemîn rêkxistina ciwanên Kurd

**Komîteya Birêveberiya Giştî ya Yekîtiya ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê!**

**Endam û alîgirên Yekîtiya Ciwanan**

Li 22ê Xakelêweya îsal, 81 sal ji avakirina yekemîn rêkxistia ciwanên Kurd re derbas dibe. Li vê serdemê de refek ji ciwanên Kurd bi hizra netewî û welatparêzî û li jêr sîbera Komeleya Jiyaneweya Kurd de biryar dan ku li pêxema rêkxistin û perwerdeya netewiya ciwanan, xebata xwe li jêr navê “Sazmana Cewanên Kurd” destpê bikin û nerîta karê bi kom û rêkxiraveyî bihêztir bikin. Her lewma, em vê roja dîrokî li hemû ciwanên Kurd  pîroz dikin û hivîdar in, Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê micidtir ji berê bo xizmet bi ciwanên Kurd tekoşînê bikin.

**Ciwanên şoreşgerên Kurd!**

Avakirina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê li ser bingeha Komeleya “J-K” û herwisa avakirina Komara Kurdistanê, derfeteke baş bû bo tevlîbûna ciwanan bi karên siyasî û netewî ku bikarin zêdetir xizmet bi armancên neteweyî  ye Kurd bikin.
Avakirina rêkxirava ciwanan li serdema Komara Kurdistanê de li jêr navê “Yekîtiya Ciwanan”(Itihadiyê Cewanan) û berfirehtirkirina berpaniya tekoşîna vê rêkxiravê li beşeke berçav li Rojhilatê Kurdistanê û herwisa hitbarkirin bi qata ciwan li birêvebirina organên Hizba Dêmokrat û demû dezgehên Komara Kurdistanê, ji aliyek derfeteke nû ya karê rêkxiraveyî û seha berpirsiyaretîkirinê li nav qata ciwanan de afirand û ji aliyê din ve jî, nîşanderê dîtina paşerojê ji aliyê rêberên Hizba Dêmokrat û bi taybet “Pêşewa Qazî Mihemed” bo perwerdekirina ciwanan û nivşa nû bi armanca birêvebirina welat bû.

Nayê înkarkirin ku Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat ji vê serdemê heta niha, çavkaniyeke girîng bo dabînkirina hêza mirovî û kadrê siyasî û şoreşgêr bo tevgera rizgarîxwaziya Kurd û Hizba Dêmokrat bûye. Şehîd “Dr. Qasimlo”, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û beşke zaf ji rêberatiya vê Hizbê, xebata xwe ji reffên Yekitiya Ciwanan ve dest pêkirine û her li wir pê gihîştine, lewma Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd bi çaveke girîng mêzeyê Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê û xebata vê rêkxiravê li pêxema maf û azadiya ciwanên Kurdistanê dike.

**Ciwanên têkoşer ên Rojhilatê Kurdistanê!**

Beşdariya xuya û berfireh a we li tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de û hewla baykotkirina binav hilbijartinan û herwisa gur û tîna we li tevgera Newroza Îsal, gelek destkevtên nû li ser berhemên tekoşîna ciwanên Kurd zêde kirin û tevî hemû givaşên ewlehî, li teror, kuştin, hews û zîndan, îşkence û bidarvekirinan de ji aliyê spaha pasdaran û îtilaatê ve bivêrane şeqamên bajarên xwe bi pêşengatiya keç û jinên xebatkar kirine meydana mafxwaziya netewî û herwisa li pêvajoya hewla baykotkirina binav hilbijartinên rêjîma Îranê de bi beşdarînekirina xwe, “NE”yek bi rêjîma tepeserker a komara Îslamî got. Tekoşîna we Ciwanan bi piştevaniya hemû qatên civaka Kurdewarî li birêvebirina rêûresmên Newroza meşxelên rizgarî û bilindkirina hêma û sîmbolên netewî, careke din ji gund û bajarên Kurdistanê  ve, peyama hişariya netewî û nasnamexwaziya we gihand.

Hişariya bilind a netewiya we li 10ê Xakelêweyê de gihîşte asta herî bilind û we da selimandin ku xebat û cangorîkirina “Pêşewa Qazî” û ciwanên Kurd bi heder neçoye û sekinandina rêûresmên Newrozê li 10ê Xakelêweyê de rengvedana vê berpirsiyaretiya dîrokî û xebata nasnamexwazane ye ku 81 sal berî niha, ciwanên Kurd çexmaqa vê lêdan û niha hûn bi gur û tîn vê berdewam dikin.




Xuya ye ku siyaseta tepeserkirin û tundûtîjî ya komara Îslamî bi armanca şikestdan û bêhivîkirinê bi rêya cihgîrkirina diyardeyên komelayetî yên xisarder û binçavkirinên bi kom û bidarvekirinên bi kom û kuştinên bi kom li şeqaman, her ji destpêka hatineserkar a vê rêjîmê heta niha, li hember ciwanan de siyasetek neguher bûye, bi keyfxweşiyê ve em dibînin ku komara Îslamî li vê siyaseta xwe de tevî ku her ser nekevt û negihîşte armanca xwe, belku xebat û tekoşîna we ciwanan bi hişariyeke herî bilind a siyasî û civakî ve, bo serêxistina tevgera rizgarîxwaziya Kurd, çirtir bûye û bi tekoşîna hemû alî û nasnamexwaziya we, li hember her cure qurixkarî û xwesepandinekê sekinîn ku dixwestin man û hebûna netewa me bêxin metirsiyê.

**Ciwanên Kurdistanê!**

**Endamên Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat ên Rojhilatê Kurdistanê!**

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî bilindragirtina tekoşîna qata ciwan li Rojhilatê Kurdistanê û xebat û tekoşîna Yekîtiya Ciwanên Dêmokrat a Rojhilatê Kurdistanê, wek yekem rêkxirava ciwanên Kurd, dubare dikin û 22ê Xakelêweyê li hemû bêrêveber û endamên vê rêkxiravê pîroz dikin ku li qonaxên dijwar ên xebatê de piştevan û hevkarê Hizba Dêmokrat û tevgera rizgarîxwaziya Kurd bûne û li qonaxên cur bi cur de li civaka navnetewî û rêkxiravên cîhanî de jî dengê ciwanên Kurd bûne. Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, ciwanên Rojhilatê Kurdistanê alxahîn dike ku xebat û tekoşîna wan bi heder naçe û xwaziyên dêrîn ên ciwanên Kurd ku azadî û serbestiya Kurdistanê ye, dê bidest ve bê.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêvebriya Giştî**

**10 ê Nîsana 2024 an a Zayînî**

# Rêzdar Xalid Ezîzî: “Felsefetya xebata Çekdariya me bo berevanî li xwe bûye”

Rêzdar Xalid Ezîzî, Berdevkê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li hevpeyvînekê de digel “Deutsche Welle” yê de li 18ê Xakelêweya îsal de li derheq givaşên dewleta Îraqê û Herêma Kurdistanê bo ser Hizba Dêmokrat li heyama derbasbûyî de îşare bi vê yekê kir ku li vê pirsa ewlehî de ku rêjîma Îranê jî pêdagirî li ser dikir, daxwaz ji hikûmeta Îraqê kiriye ku hêzên Hizba Dêmokrat axa Îraqê bo êrîşkirin bo ser hêzên Komara Îslamiya Îranê li Kurdistana Îranê, bi kar neyînin. Me li heyama çend salên derbasbûyî de ew yeka nekiriye.

Eva ku Komara Îslamî wek pakêceke ewlehî digel Îraqê axivîye, vedigere bo Komara Îslamî bi xwe li navxweyê Îranê û Kurdisytanê, her demek li navxwyê Kurdistana Îranê de xebata xelkê an tevgera mafxwazane digîje asta herî bilind, Komara Îslamî hewlê dide ku raya giştî ya xelkên Îranê ji rê derxîne û bibêje ku li derveyî sînoran, gef li ser ewlehiya welat heye.

Me bi dehan car gotiye, hem digel hikûmeta Îraqê û hem digel Hikûmeta Herêma Kurdistanê de jî me bas ji vê yekê kiriye ku em destêverdanê li karûbarên navxweyê Îraqê de nakin û li dijî Komara îslamî jî ti çalakiyeke leşkerî me nakin.

Dema li navxweyê Kurdistanê de bi hilkevtên cuda ên wek Newroza Îsal mijûlê xebatkirinê ne û daxwaza mafên xwe dikin, hewce nake ku me çalakiya çekdarî hebe. Em digel rêkxistina Netewên Yekgirtî, hikûmeta Îraqê û hikûmeta Herêma Kurdistanê mijûlê danûstandin û gotûbêjan in û startejiya me ew yeka ye ku rêzê ji karûbarên navxweyî yê Îraqê bigrin lê pirsa bûn û nebûn û çend û çawatiya bûna me li Îraq û Herêma Kurdistanê, mijarek e ku pêywendî digel dewleta Îraqê û karûbarên navxweyî yê Îraqê ve heye, ne digel Îranê!

Li wan mijarên ku pêywendî bi Îranê ve heye, me hewl daye digel hilkûmeta Îraqê û hikûmeta Herêma Kurdistanê lihevkirinê bikin û bi awayekê bi rê ve bibin ku bi qazanca me hemûyan be.

Rêzdar Xalid Ezîzî li derheq zêdebûna givaşan bo ser Hizba Dêmokrat bi armanca çekkirina Hizba Dêmokrat bas ji vê yekê kir ku pirs çekkirin an çeknekirinê nîne, rewşa Îraqê bi awayekê ye ku her kesê çek heye, çekdarbûna me jî li wir gefeke leşkerî an ewlehî bo ser Îranê nayê hisêb, her wekî min bas kir, ew mijarek e ku dibe li navbera Hizba Dêmokrat û dewleta Îraqê û Herêma Kurdistanê de li ser rêkevtin bê kirin. Li rastiyê de Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li civaka ne ewleh a Îraqê de dibe ewlehî hebe û ew ewlehiya dibe bi çi awayekê bê dabînkirin, ew pêşmergeyên vê Hizbê ne ku beşek ji ewlehiyê ne.



Rlzdar Xalid Ezîzî li derheq dîtingeha beşek ji Oipozîsiyona Îranê jî li derheq metirsîdarbûn a Hizba Dêmokrat li Îrana paşerojê de gotiye, Hêza Pêşmergê Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê, beşek ji berevaniya xelkê Kurdistanê li navxwyê Kurdistanê ye li demekê de ku komara Îslamî êrîş kiriye ser Kurdistanê, lewma felsefeya bûna vê tevgerê, her tim bervanî ji xwe bûye, me ti car bajarên derveyî Kurdistana Îranê de çalakiya leşkerî nekiriye, felsefeya xebata çekdariya me bi ser me de hatiye sepandin û bo berevanî ji xwe bûye û ew hêceta ku komara îslamî bas dike ku bi gotina wan em li ser ewlehiya Îranê û serweriya axa Îranê bûne gef, bi ti şêwazekê rast nîne.

Siyaseta Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî tekezkirin li ser mafê netewî yê netewa Kurd li Kurdistana Îranê û xebat bo kiriye û bi vê sedemê hatiye avakirin, eva ye ku me li hevahengî û hevkarî digel rêkxirav û Partiyên din ên Îranê, bikarin eniyek hebe û gotara hevpara me hebe û tevgera Jînayê jî ew yeka da xuya ku bi keyfxwesiyê ve niha bi berhevdanîn digel salên berê, li Îranê de pirsa Kurd aliyeke din li xwe girtiye û heta asteke baş jî digel vê mijarê aşina bûne û dikarim bibêjim ku gelek berdengê me hene, startejiya komara Îslamî eva ye ku raya giştî ji rê derxe ku li Kurdistana Îranê de li dijî ewlehiya netewî ya Îranê gef heye û sedema êrîşkirin bo ser Kurdistanê û herwisa ser binke û bargehên Hizba Dêmokrat bi mûşek û dironan, bi serastî ew yeka bûye ku bib vtevahî nerast e û statejiya wan ji rêderxistina hizra giştî ya xelkê Îranê li dergeq pirsa Kurdistanê ye.

Rêzdar Xalid Ezîzî li derheq pirsa gotûbêj digel Komara Îslamiya Îranê de gotiye ku li siyasetê de li xebata netewiyaekê de an li taktîk û stratejiya her partiyekê de pirsa gotûbêj heye, niha ti gotûbêjek li navbera me û komara îslamî de nîne û em li ser vê bawerê ne ku hekî komara Îslamî pêşniyarê jî bike, ti sedemek nîne ku em digel wan rûnên.

Rêzdar Xalid Ezîzî li derheq bûyerên serdema şoreşa Jîna û dîtingeha Hizbê li derheq gotûbêj û rûniştin digel alîgirên sîstema paşayetî de got: “Me nizama paşayetî û seltenetî ceribandiye, lewma Hizba Dêmokrat digel nizamekê ku ceribandiye, nikare here qonaxa gotûbêjê. Herwisa ku komara îslamî û nizama sosyalîstî û komonîstî jî me ceribandine.

Ev yeka bi waterya dujminatî digel wan aliyan nîne, me ti gotûbêjeke rasterast digel wan bo paşeroja Îranê nebûye, çimkî li dîtingeha me ve ew sistem hatine redkirin.

Li derheq bi navenda hevkarî ya Hizbên Rojhilatê Kurdistanê, Kak Xalid got: li pêvajoya tevgera “jîna”yê de û piştî vê qonaxê jî çêkrina altirernatîv li dijîê komara Îslamiya îranê de me li rastiyê de cudatiya dîtingehan hebû, zêdertir jî pêywendî bi rêkevtina “George town”ê ve hebû, em li Hizba Dêpmokrat de dijî vê rêkevtinê bi vê şêwazê bûn, dijî naveroka vê bûn ku bi vê pêkhateyê, lewma Navenda Hevkarî wek berê nema û niha çalak nîne, tevî vê yekê jî rûniştinên me hebûne da ku ji nû ve vê navendê çalak bikin û bizanin ku dê çawa vê pênase bikin.

Rêzdar Xalid Ezîzî li derheq hilsengandina tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê ragihand: “Tevgera Jin Jyan Azadî, pêvajoyeke siyasî ya xelkê a bi taybet xelkê Kurdistanê û bi awayê giştî ya Îranê bû ku li rastiyê de mirov dikare li ser biaxive. Hewceye bala aliyên cuda bo vê tevgerê rabikêşin. Wê tevgerê hejmarek taybetmendiypên berçav hebûn, li rastiyê de jin li Îranê gihîştine vê encamê ku zêdetir ji berê, hewcehî bi serîhildana medenî hebe û dirûşma Jin Jiyan Azadî li navxweyî Îran, Kurdisrtan û heta li derve jî piştevaniyeke berfireh lê haye kirin, aliyê dinê ve ev bû ku bi balkêşandin bi rewşa Kurdistanê, ev tevgere bû tevgereke netewî û li rastiyê de curek serîhildana medeniya Kurdî li dijî nizama Komara Îslamî bû ku hevdem dêmokratîk jî bû.

Aliyê din ev bû ku vê tevgerê karî mifahek baş ji sosyalmediyaê verbigre û li dawiyê de nebûna yekîtiyê bû ku li vê tevgerê de dihate xuyakirin, xelkê gelek nirx dan lê rêkxirav û saziyên Îranî, nekarin herin nava vê qonaxa nû û ew tevgere wek alternatîv bo piştî komara Îslamî bibînin.

# Sê awayên nakokî û pevçûnan



N: N. Elî Munezemî



Hêgêl dibêje ku di navbera hikûmetan de, dema wîst û daxwazên diyar nekarin bingeheke hevpar peyda bikin, dibin sedema derketina şer. Rastiya wê yekê di şer û pevçûnên navbera Îran û Îsraîlê de xwe da eyankirin.

Daxwaza Îranê gihîştin bi seerdestiyê di herêma Rojhilata Nawîn de ye û ew yeka jî dijberî daxwaza Îsraîlê ye ku cehdê dike bi her awayeke mumkin xwe biparêzê û nehêle ku carek din tûşê qirkirinê were.

Serdestiya Îranê ku di wê demê de cehd dike bo nehêlana Îsraîlê, tam berevajîya wîst û daxwaza Îsraîlê e.

Bes bo herduyên wan hikûmetan, şer wek dirêjahiya siyasetê, liser bingeha daxwazên wan, tiştek ne ciyê înkarkirinê ye.

Ew şera herçend ku bi dehan sale didome, lê di heyamê wan çend heyvên derbasbûyî de gihîştiye xaleke hestyar û pêkdadan û hêrişên rasterast liser hev.

Di wê gotarê de yê ew nakokî û pevçûn di bin siya teoriyên pêywendiyên navnetewî dê bikeve ber tîrojkan û zelalkirinê.

Di teorîyên nakokiyan de Anatol Rapoport bas li sê awayên nakokiyan dike ku ew sê şêweyên nakokiyan bo pêywendiyên navnetewî jî rastin.

**1.** Pevçûn û pêkdadan: Hander yan motîvasiyonên dijminatiya dualiyane ye. Şer bi wê taybetmendiyê ye ku aliyên pevnakok hewl didin liser hevûdu de bi ser kevin an jî hevûdu tune biki. Aliyên dijber cehdê dikin ku argûment û delîlên hev di şereqise de bikujin û hindî ji destê wan were hev rezîl û riswa bikin.

**2.** Lîstik: Anku aliyên dijber hewl bidin di çarçoveya yasayan de hevdu dewr lêdin. Mebesta lîstikan serkeftin e, bêyî ku hecet û delîl rast bin, an ne rast bin, wek “lîstika pisîkê bi mişk re” be.

**3.** Munaqişe û behs: Berevajî ew awayên serve, di nîqaşan de armanc eweye ku dijber bigihîje qenaetê û raya xwe biguhere.

Ew sê awayên nakokiyan bo wê hindê li aliyê Anatol Rapoport ve hatine danîn ku aliyên dijber bikarin li şer û lîstokan xwe xilas bikin û bikarin li rêka nîqaş û diyalogê ve pirsgirêkên xwe çareser bikin.

Lê ewa ku xûyaye, pêywendiya navbera Îran û Îsraîlê rêyek berevajî girtiye pêşiya xwe û li dostayetiyê ve gihîştiye şer û pevçûnan.

Ewê yekê jî niha rewş hind aloz kiriye ku hemû welatên zilhêz û xwedîberjevendî anîne ser xet ku bikarin wê nakokiyê bi awayekê kêmzerer çareser bikin û carek wê nakokiyê pileyekê daxînin jêr.



Di wê nakokiyê de niha ku herdu alî gihîştine peyçûnên rasterast, piştî êrişa hajekî û dronî a Îranê, niha hemû aliyek çavên wan liser berteka Îsraîlê e.

Helwesta karbidestên Îsraîlê nadin xûyakirin ku ew xwe li şer paşve bikşînin û bi awayek din tevbigerin.

**Bersiva Îsraîl, dikare pêşeroja Rojhilata Navîn diyarî bike û ew yeka yê bandora xwe ser rewşa kurdan bi giştî û kurd li Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê bixasmanî hebe.**

Liberku Îran hem dagîrkerê perçek li Kurdistanê ye, hem di birêvebirina Îraqê de rolek sentral heye û hem jî piştîvan û hevpeyman û parêzvanê hikûmeta dagîrker a Sûrîyê ye.

Ew yeka jî argûmentek bihêze ku hêz û hereketên kurdî bikarin cih û eniya xwe di wî şer û nakokiyê de destnîşan bikin.

Xalekê din jî heye ku bandora kurdan û bixasma şûn û pêgeha Başûrê welat di wê aloziyê de dike xwediyê girîngiyek taybet.

**Eger ew şer û alozîyane kêmser jî bibin, bi îhtimalek zaf yê welatên hevpeymanê Îsraîl, qelxan û mertalên xwe bo parastina Îsraîlê yê di herêma Kurdistanê de cihgîr bikin.**

Ew yeka hem dikare fersend be bo kurdan di wê perçeyê de û hem jî dikare bibe tehlûke.

Kurd dikarin hemû tehlûkeyan biguherin û bikin fersend eger yekgirtî bin û xwe li bin sî û bandora rejîma Îranê de derxînin.

Kurd dibe herwisa xwediyê pilanên xwe be û wê carê xwe neke qurbanî bêy ku wîst û daxwazên wan di pîlan û projeyan de cih girtibin.

Kurd dikare kartên xwe û helkewta jêopolîtîka kurdistanê bo armancên xwe bikar bîne û doza azadiya kurdistan baştir li her demekê pêş bêxe.

# Hizra şaş û neguncav



N. Hesen Mukerem



Bingeha mirov girêdayî ziman û kultûr û cihê jidayîkbûna wî ye herçend ku bi derbasbûna dem û şert û mercên jiyanê û zordestiyan neçar bibin ku cihê xwe biterkîne,Gelê me yê Kurd jî wisaye.

Yanî dagîrker bi hemû hêz û şiyana xwe hewl dide ku Kurdan neçar bike da ku Kurdistanê yanî cihê bav û kalan û cihê serhildana mirovahiyê bicih bihêlin û li welatên din yanî Ewrupa û Amerîka û ... hwd de bijîn lê her Kurd in.

Herçend ku li welatên biyanî de dijîn û bi zimanê biyanî jî biaxvin jî, lê dema ji wan pirs tê kirin ku ser bi çi neteweyekê ne, yan ziman û kultûra wan çiye di bersiv de dibêjin em Kurd in û li Kurdistanê jidayîk bûne.

Heta eger ku takê Kurd nasnama xwe li cemsera mezin a Erupayê yan Amerîka û ...hwd wergirtibe û wir jyabe jî lê di bingeh de Kurd e û xelkê Kurdistanê ye.

**Çimkû jiyana zordestî û bindestiyê ev hînî vê yekê kiriy e ku hizra dûrî ji welat yan îhsasa xwedî welatbûn û bikaranîna çi peyvekê ji dagîrker re didin famkirin ku ev kiryarên dagîrker zêdexwazî û cinayet in li derheq neteweya Kurd de û ev nikarin bêjin ku ev xelkê welatek din in ev gotina jî ji ber vê nîne ku wekheviyê nîşan bidin, ji ber ku ev behsa heqîqetê û mafê xwe dikin ne tiştek din.**

Bo mînak dema li keseke Rojhilata Navîn ku li Ewrupa dijî pirs dikin ku tu kêyî?

Rast dibêje ez xelkê filan welatî me, ji ber ku nasname bi sêçarîk yan pêka navçên hatinî veqetandin parve nabin û mirov nikare hevdem xwediyê çendîn nasnaman be û ev hemû zayend û pêkhate, pêka kom pêver û taybetmendiyên tam cuda hatine afirandin.

**Lê, piştî derbasbûna çend sedsalan bi ser parvekirina Kurdistanê û dûrxistina parek ji Kurdan ji ax û welatê wan, dagîrkerên Kurdistanê hîn jî bi hizra şaş a xwe hewl didin Kurdan bi girtin, bidarvekirin, dûrxistin û afirandina astengiyan li pêşiya wan û cudahîdanînan, hebûna neteweya Kurd û Welatê Kurdistanê înkar bikin**



**lê ev hemû kiryarên han dibin sebeba heqîqeta pejrandina dagîrker bi canlibereke kêrnehatî û zêdexwaz bo azardana gelê bindest û maf lêxwarî yê Kurd, lê bi vê hizra şaş û neguncav ti carî nikarin ber bi pêşve herin û gelê Kurd înkar bikin û Kurd her roj hişyartir û mijara xwedî derketin ji nasname û Kurdistanê di nav gel de hestyartir û rojevtir dibe.**

Ji ber ku mirov çiqas di bin givaşan û zordestî û dûrî welat û axa xwe be mirov evqas şoreşgir û çalaktir li berê dibe.

Dujminên gelê Kurd bi serkutkirina serhildana Agiriyê li heyama salên 1926_ 1930`an a Zayînî de li çiyayê Agirî, yan bi serkutkirina Kurdistana Sor di sedsala 20`an de yanî dinavbera salên 1914`an heta 1918`an de, yan bi herfiandina Komara Kurdisanê li Mehabadê li sala 1946`an a Zayînî de ...hwd

hewl dan ku hebûna gelê Kurd û welatê Kurdistanê înkar bikin lê tevî wan hemû înkaran gelê Kurd di serhildana "Jînayê" li Rojhilatê Kurdistanê yanî li sala 2022`ana Zayînî de

yan Newroza îsal yanî Newroza 2024`an li herçar parçên Kurdistanê yanî li Urmiye û Makû heta Îlam, Diyarbeker heta Wanê, li Qmişlû û li Hewlêrê heta Akirê

digel hemû astengiyên pêşiya gel hebûn, keç, xort, jin û zilmanên Kurd bi girise û coş Agirê Newrozê pêxistin û destê hevdu girtin û bi lidarxistina dîlan û şahiyê dora Agirê Newrozê

hebûn û serpêbûna gelê Kurd ji dagîrkerên Kurdistanê û tevahiya cîhanê re nîşan dan ku Kurd heye û li her cihekê be jî xwedî nasname û kultûra taybet a xwe ya Kurdî ye, û hunermendê Kurd Hesen Derizî jî di strana xwe de dibêje:

Veten qewm û kesûkar e, veten himbêz û dildar e , veten dêvaney te bixwe me eger tu min qebûl be xaka ber pêy te me eger tu min qebûl be serbazê ser rêya te me.

# Rewşa Îranê



N:Kofîxwar

Li gorî nûçeyên rojevê dewleta Amerîki ji zû ve kap kiriye li hûstiye Îranê. Heta lê bê li nav dev û diranên xwe de ji wir wê de wê kaş bike. Amerîka çima ku bê li gorî hesabî wî hêza Îranê her carê xerç dike, rê nade ku ew piçekî bi xwe bê. Beriya hewldaneke Îranê, Amerîka yekser mijûlekê pe re derdixîne. Amerîkayê xwe bi Êraq, Efxanistanê ve ceribandiye, tu carî bi destên xwe ve lawazkirina tu dewletekê nake. Tenê bi aşkere an hişyariyan dide an jî bi ser UNê daxwazên xwe pêk tîne.

Rêbaza wê ev e. Amerîka Fêlbazekê mezin e, agir geş dike lê destên xwe nake li nav agir. Rewşa dewletan dizane, li gor wê jî her 15-20 salan bi dilê xwe li dinyayê ji nû ve dîzayn dike. Peşiyê dewletan ji hundir ve lawaz dike, bes paşê desteser dike û hefsarên wan hildide bi destên xwe.. Tê zanîn ku bi şoreşa bihara Erebî ve li Rojhilata Nawîn bigir heta Efrikayê gelek dewlet lawaz xistin, ji nû ve dîzayn kirin. Ji pey re bi êrişên Daîşê ve dest avêtin li dewleta Sûrî ku pişta wê Rûsî hebûn.
Bi piştgirîya PYDê hîn dever kirin di bin kontrola xwe. Bi şerê Ukranî-Rûsî ve jî Rusya ji Surî derxistin. Bes xwe hêj li wir in, hem jî têr û tije berûbarûd, cebilxaneya xwe ve. Projeya dîzaynkirina Rojhilatê jî bi dehan sal in bi destan e ku pê de pê de bi dîzaynan ber bi Îranê ve tê. Bona vê dîzaynê, bona çêkirina rêyên nû, yên bazirganiyê çi astengî hebe yekoyek ji holê radike.

Şerê Ukranî-Rûsî jî perçeyek ji vê planê bû. Xwest bi şerê Ukranî-Rûsî ve Yekîtiya Ewrupî pitir Alman û Fransê bi xwe ve girebide. Xwest dewletên ku li derveyî natoyê(Îskandinavî) ne têxe bin sîwana Natoyê herweha ya xwe. Nişanî wan da ku ew şer wek gefekî mezin e, wek metirsiyeka êrîşanan e ya li ser dewleten Ewrupî. Şerê Ukranî-Rûsî di alîkî de hem lawazkirina Îranê ye hem jî lawazkirina piştgirîdayîna Rûsan bû. Helbet wekî bi van gotinan ewqasî hêsan û rekûpêk ev plan bi rê ve neçû. Hîn caran tiştên ne hesapkirî derketin. Tenê piçek armanc dereng ket. Lê yekoyek plan bi cî tê. Hezkî bi dehan, bi sedan insan bêne kuştin an jî bibin koçber ne xema wan e. Xwe degiravî hiquka pergala şêr heye, bes xeynî armanca wê tu tişt girîng nîne.

Şerê Xezzê jî perçeyek ji vê armancê ,ji hewldaneka dizaynê ye. Jixwe Netenyahû çend roj berê gotibû tu kes, tu hêz nikare me ji dûrî vê armancê bixe. Niha tê dîtin ku Îranê çong daye. Amerîkayê dîyar kir ku em tim û tim bi Îsraîlê re ne. Ji ber ku biqasî mîlyonan cihû li Ewrûpayê li Amerîkayê dijîn, dîasporeka xurt in. Bandora wan li ser Ewrûpîyan, Amerîkîyan heye. Bandora bi hêzbûna wan e ku Îran piştî êrişa ku Îsraîlê li Konsûlxaneya wan ya li Şamê kir bi kuştina çend fermandarên wan ên mezin, bi kuştina zarokên Îsmaîl Henneyê ku Serokê Hamasê bû çû li Amerîkayê.


Got bila Îsraîl dev ji vî şerî berde, hişyariyê bide ku Îsraîl bi dawîkirina êrişan bike. Amerikîyan jî serê wan mizda got"belê belê."Îran bi xwestina xwe gava ku çû li ber derîyê wan êdî xilas çong daye li erdê. Ji vê wek lawazbûna Îranê binirxînin. Li gorî zanyariyên nûçeyan Îsraîlê gelek zirar daye li Hamasê herweha li Îranê. Îsraîl ne tenê bi Hamasê re şer dike bi heman demê de bi pîyonên Îranê re yên derûdorên sinorên dewleta wê ne şer dike. Di alîkî de êrişî Hûsiyyên li Yemenê, di alîkî de yên li Lubnanê dike ku bi hêsan biçe li ser îranê, têxe rêzê xwe. Bi raya min li navbera Îranê û îsraîlê şerekî wek yê Xezzeyê dernakeve. Ji ber ku Amerîka naxwaze. Bes dixwaze Îranê ji nû ve dîzayn bike, dibe ku bi şêweya federatîf, ne ji hole rake. Jixwe xelkê Îranê dixwazin li ser axa xwe xweyî erk û serweriya xwe bin, dewleta xwe ya dêmokratîk ava bikin. Anku mafên xwe yên bingeh ên self determinîzmê bi kar bînin. Bawer bin Kurd û Belûcî ji sedî sed di vê hizrê de ne.

Lê Faris tu carî naxwazin dagiriya Kurdistan û Belûcîstanê xilas bibe. Lewma divê kurd û Belûcî bi fêlên Farisan neyên xapandin. Ji ber ku hewleke Farisan a bi vî hawî heye. Hizra Farisan eve ku malbata Şah Pehlewî vegere û hemû neteweyên Îranê bi pergala Pehlewîyan li bin siwana dewletê anku bi serweriya farisan bijin. Neteweyên ku bi dagirkeriyê ve serwerî yên din bin nikarin pergaleka nû derxînin, nikarin pirsgirekên xwe çareser bikin. Nikarin tu carî dêmokratîze bibin. Di meya wan de tiştekî wusa hîç nîn e.

Tirkiyê ve bigire heta Dewletên Ewrupî heger Îsraîl êrîşî li ser Îranê bike, Naxwazin pirûskên şêr bipeşke welatên wan. Lewma têkîliyên li gel Îranê û Îsraîlê dane sekinandin. Hatin û çoyîna balafiran rawestandin, danûstandina bazirganiye kem kirin. Lê hêj hemwelatiyên xwe ji Îranê dernexistin bi raya me şerê herdûyan dest pê nake. Belê Îran lawaz bû wê her biçe lawaz jî bibe. Ji zû ve ye Amerîkayê dorpêça aborî daniye li ser. Bi sedema wê li nav Îranê aborî gelek xirab e. Zexteka mezin ya siyasî aborî, hizrî li ser xelkî Îranê heye. Her roj ciwanen kurd yên siyasî an ne siyasî yên ku neçar mane kolberiye dikin bi destên pasdaran bi hêsanî têne kuştin. Îran niha wek dûpişkekê ketiye kêmine dora wê dorpêç kirine û agir pêxistine. Yan wê bi agir yan bi jehrê ji nav biçe...Jehra wê jî Kurd û Belûcî ne. Dawiya dawî rejîmê ji pey şerê Îsraîlê têk biçe. Wê an reformîze bibe an jî fedaratîv.

ji sedema ku di dewletekê de heger insanên wê jê nerazîbin dawîya dawî ew dewlet an jî pergala wê têk biçe, xilas! Ya rasti pêşeroja her perçeyen Kurdistane hekî bi rewşa Îranê ve ne girêdayî nebûya ne xema me bû têkçûyin, ne jî serkevtina wê. Niha Rojhilatê Kurdistanê bindestên dewleta Îranê de ye, Başûr li kêlega wê ye, herweha Rojava û ya perçeyên mezin Bakûr jî. Hemû dagirkerên Kurdistanê ji hêla Kurdistanê de helwesteka jênosîdkar li hev kirine. Bes wek morikan bi lawazbûna Îranê ve ew ên belaw bibin. Ji bo kurdan ew ê bibe fersendeke pir mezin. Heger kurd bi helwesteka neteweyî bi xwestineka israr îstiqrar doza Kurdistanê serbixwe nekin, dê di bin lepên dagirkeran de dîsa her roj belewela bêne kuştin, dê dîsa heta demeka dirêj bindest bin, xûlam bin.

Divê wek nan û avê pêdivîya kurdan bi dewletê hebe.



## Nerîna



**“Xalid Ezîzî”:**

**“Xalid Ezîzî: Felsefeya xebata me ya çekdarî parastina xwe bûye”**



**“Nêçîrvan Barzanî”:**

**“Nêçîrvan Barzanî: Îraqeke bihêz hewcehî bi Herêma Kurdistanê ye û Herêma Kurdistanê ya bihêz jî hewcehî bi Îraqeke federal û aram e. ”**



**“Jens Stoltenberg” :**

**“Stoltenberg: “Tu kes ji şerekî din ê li Rojhilata Navîn sûd wernegirtiye.”**



**“John Kerby”:**

**“John Kerby: Eger Tehran bi rastî agirbestekê dixwaze, divê zextê li Hamasê bike ku lihev bike.”**

# Di roja cîhanî ya Azadiya Nerînan de jî ragihandina Rojhilat her di nav sînoran de ye!



**N. Eskender Ceiferî**

Roja 3ê Gulanê, roja cîhanî ya Azadiya Nerînan, nêzîk dibe lê rengek nû ji bo azadîxwazên Kurdistan û Îranê tê de nayê dîtin.
Ev rêjîm jî, wek rêjîma berê li ser tepisandina Kurdan û bi taybet sînordarkirina ragihandina Kurdî berdewam e.

Dayîn û standina zanyariyan li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, kontrolkirî û qedexe ne. Rêjîma dagirkar a faşîstên Tehranê ya di bin siya axundên Cemaranê de jî weke rejîma şahê Farsan, her û her azadiya welatiyan û nerînan kontrol û sînordar dike.

Dibe ku rojnanevanek ji ber belavkirina nûçeya girtina kesekî yan jî zanyariyên li ser darvekirina kesekî, bi salan bê girtin. Li wir fîltêra zanyariyan heye ku divê di berjewendiya rêjîma dagirkar de bin.

Li gor benda 12 ya Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve di 10'ê berfanbara 1948'an de hate pejirandin, ti kesek nabe ji ber sedemên weke jiyana arizî, malbat xanî an jî ragihandinê, rastî ziyanê bê. Îran jî, yek ji wajokerên wê danezanê ye, lê belê ti xaleke wê bicî nake.

**Li wî welatî, qet ne Zertiştiyan ne Behayiyan û ne jî Yarsanan mafê derxistina tenê belavokekê jî nîn in. Rêjîm, hem van kêmîneyan û hem jî kêmîneyên ku di yasaya bingehîn a rêjîma Îranê de navê wan hatiye, difetisîne û bi merca ku zanyariyên wan di berjewendiya rêjîmê de bin, rê didin wan ku weşanê bikin.**

Ev jî yasayên exlaq û azadiyan binpê dike ku li gora wê yasayê, Mafê her kesî yê azadiya ji bo raman, wijdan û olê heye. Eger jî di asta cîhanî de tê gotin ku Mafê her mirovî heye ku




bixwe bi serbestî û azadî tevlî jiyana çandî ya civakî bibe, lê li Îranê eger ew mirov girêdayî ola Îslamê nebe, jê re pir dijwar çê dibe ku beşdarî karûbarên ragihandinî bibe.

Li gor xala 731 ya Yasaya Cezayên Îslamî li Îranê, her rojname, malper yan ragihandinek ku zanyariyeke li dijî rêjîmê belav bike û partî û aliyên dijberên Komara Îslamî bikarin li dijî berpirsên rêjîmê mifahê ji wan zanyariyan bistînin, wê demê ew malper yan sazî tê cezakirin ku wan zanyariyan belav dike.Kesê ku bi vê tometê tê darezandin bi dayîna pere ji şeş milyon Tumenan heya çendîn salan girtinê tê sizakirin. Herwisa xalên 747 û 748'an yên yasaya sizayên rêjîma navbirî, amaje dike ku eger kesê tometbar bi belavkirina zanyariyên li dijî rêjîmê, karmendê dewletê be, dibe ku tevî dûrxistina wî ji kar, rastî girtinê yan jî derbeyên qamçiyê bê.

Tevahiya saziyên ragihandinê yên çapkirî li Îranê, çi yên dewletê û çi jî yên dervey desthilatê, divê derfeta çalakiyê ji wezareta Çanda Îslamî bistînin. Ew di dema standina derfetê de hin belgeyan wajo dikin ku tê de amaje dike daxwazker nabe ti çalakiyekê li dijî rêjîma Îranê pêk bîne ku bikare di berjewendiya partiyên dijber de be.

**Li Îranê û li Rojhilatê Kurdistanê jî, tenê dewlet dikare xwediya têlêvizyonan be. Xelk yan xwediyên sermaye û simyanan jî dikarin çend demjîmêran ji bo programekê ji xwe re bikirin.**

Lê mafê wan yê avakirina TV û radyoyan tine ye. Ew tenê dikarin belavokan bi wergirtina derfetê ji dewletê çap bikin.

Beriya niha Mehdî Kerûbî berendamê serkomariya çend gerran, Elî Muteherî parlamenter û hin kesên din dixwastin derfeta avakirina radyo û têlêvizyonê bistînin. Lê tevahiya wan daxwaziyan hatine redkirin. Sedem jî ev e ku rêveberiya saziya têlêvizyona wî welatî ku weke Deng û Rengê rêjîma dagirkar a faşîstên Tehranê tê binavkirin, di bin çavdêriya rasterast ya Elî Xamineyî rêberê rêjîma Komara Îslamî de ye. Bi vî rengî jî li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, tenê Xamineyî xwediyê radyo û têlêvizyonan e.

**Rêjîmê bi hemû şiyana xwe, hêza xwe ji bo jinavbirina dengên nerazî bi kar aniye û weke çanda ku Xumeynî avakerê rêjîmê ji wan re daniye, ew jî her û her di vê rêbaza çewt û gemar de berdewam in.**

Ew ragihandinkar û rojnameyên ku li gor yasaya bingehîn a rêjîmê, binpêkarî encam dane, di yek ji van sê dadgehan de dikarin bêne dadgehîkirin yan darezandin: Eger rêveberên saziyan li hemberî wan gilî kiribin, li Dadgeha Çapemeniyê têne darezandin.
Eger li gora ku ew dibêjin, ewlehiya netewî aloz kiribe, li Dadgeha Çand û Ragihandinê têne darezandin. Eger jî Xumeynî avakerê rêjîma Komara Îslamî yan jî Elî Xamineyî rêberê niha yê vê rêjîma gemar rexne kiribin, li Dadgeha Şoreşa Îslamî têne darezandin. Sedem jî ev e ku li vî welatî mafê kesî nîn e wan du kesan rexne bike.

Bi kurtî, li wir tenê mafê azadiya nerînan, ji bo rêjîmê heye ku dikare li dijî dijberên xwe her tiştî bêje. Lê ti dengek cuda û ciyawaz, nikare li hemberî rêjîmê bilind be.

# Dibe ku dengdayîn bi pere be



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**



Niha ku gengeşe li ser berbijêriya hilbijartinan dest pê kiriye, em helwestekê digrin û dipirsin gelo nûneratiya serkomariya welatekî bes e yan nûnertiya xelkê di parlamentoyê de ye?

Na, ne bes e, divê mirov we ji bo vê postê guncaw bihesibîne, wê demê partî dê wî li gorî jêhatîbûna wî destnîşan bike.

Di rastiya xwe de ev teorî li Rojhilata Navîn derbas nabe, ji ber ku kesê ku gaveke wiha bavêje beriya her tiştî xwasta xwe û paqijiya partiya xwe esas digire.

Nivîskar û rexnegirê sînemayê yê Amerîkî George John Nathan dibêje:

**“Nûnerên xirab ji hêla mirovên baş ve têne hilbijartin, nemaze yên ku deng nadin.” Wirda mebest ev yeka ye ku tu wekî dengdêr dema ku hilbijartinan baykut dikî rê ji nûnerên xirab re xweş dikî ku serbikevin.**

Dema ku rêya sandiqên denganê didî berahîka xwe bingehek baş a naskirina wisa hebe. Ji ber ku ew dengdêr e ku biryarê dide ku deng bide yan na?

**Çima berbijêrekê filan û bêhman hildibijêre?**

Ji ber ku dengdana rasteqîn pêvajoyek wisa hestiyar e, divê hem berbijêr û hem jî dengdêr hay ji biryarên bi zanebûn, biryardana çarenûsa hemû civakê hebin, ne tenê xwe, îmtiyaz û mûçeyên xwe.

Berpirsiyariyeke mezin e ku kesek xwe nûnerê bi milyonan kesan bihesibîne û ji bo wî jî berpirsiyariyek mezintir e ku hûn biryar bidin ku baweriya xwe bidin partiyek an berbijarekî partiyê ku bibe nûner an serokê we.

**Gelê rojhilat bi giştî, Kurdistan û Îraqê meseleyê bi vî awayî şirove nakin, ji ber ku eger analîz bikirana û têbigihaştiba, hizara xwe li ser vê parçe nedikirin û bê hizr nediçûn ser sindoqan hilbijartinê.**

Dengdan wek çekekê ye ji bo vê yekê ku mifaha vê hebe, ev jî girêdayî wî mirovî ye ku dê çawa vê bikar tîne.

Bi wateya wî dema dengdanê dişbe tiliyên te li ser çekê, nişikêva gule tê avêtin û divê wisa nîşana diyar bikî ku li emancê bidî, eger tu nîşanê nedî nizanibî ku çi karesatek diqewime, pir girîng e ku em armancên xwe pêka dîtina kesên din ve nebînin, divê di nav hizra xwe de hûr kiribe û têgihîştibin û biryar dabe. “Theodore Roosevelt” dibêje:

Neteweya Kurd xwedî ezmûneke dûr û dirêj di têkçûna peymanan de ye, ku gihiştiye wê astê ku bûye henek.

Divê em li ser vê pêvajoyê micidtir bifikirin û di derbarê dengdana nûneran de bêtir bi zanebûn biryar bidin.

**Pêka ezmûnan be jî ji me re hatiye cerbandin ku heta niha ti hilbijartinek çi li Îraqê û çi jî li Kurdistanê guherînkariyek bingehîn di jiyana xelkê pêk neaniye, ti kabîneyeke hikumî jiyana xelkê nekiriye esasa karên xwe,ti kabîneyek ji ya berê baştir nebûye, heta xirabitir jî bûye.**



Eger hemû mirovek wisa hizr bike ku dengê wî ê di hilbijartinan de dive bibe sebeba guherînkariyan di welatê wî de, û dengdan berpirsyariyek e exlaqî ye li hember jiyana wî di civakê de, wisa eger kêm jî be guherînkarî her çê dibin.

Di heman demê de, xwe berbijêrkirin ji bo her meqamek ku ew bi dengdanê bi dest dixe, gavek bi tevahî exlaqî ye li pêşberî mirovên ku deng didin wî û ji wî bawer dikin ku hûn di jiyana wan de guherînkariyekê çêbikin.

Li welatê me axaftin û protestokirin ji her tiştî erzantir e û li welatê me û li seranserê cîhanê dengdayîn belaş e, lê eger dengdan bi pere ba diba ku em micdtir bibana di dengdanê de.

Em hemû li ser giringiya dengdanê hevhizir in, lê heya niha jî em nizanin çima giring e, ji ber ku eger me bizaniya em qet du caran li pey hev dengê xwe nadin heman partiyê yan berbijarekî, çi berbijarê me yan jî partiya me bûya.

Di dawiyê de, divê em vê pirsê wek rêveçûn û dengdanê wek berpirsiyariyek exlaqî û pabendbûneke wisa mezin bibînin ku dê li welatekî, navçeyeke, cîhanê de guhertinekê çêbike, eger em nefikirin ku pêwîstî bi lidarxistina hilbijartinan nîne.

# KÊŞEYA CIVAKA ROJHELATA NAVÎN Û RIYA ÇARESERÎYÊ



N. Hasan Harrani



Li ser civak û dîroka rojhelata navîn gelek analîz û lêkolîn hene. Hema bêje exlebên van analiz û lêkolînan di warê ne demokratîkbûnî û pergalên sazimanîya dewlet û civakê de ne. Bi awayekî encamname derdikevin pêş. Lê mixabin divê mirov bîne ziman ku di van analîz û lêkolînan de derketina encaman rastbin jî, pêdeçûna destpêkê û destnîşana sedeman de gelekên wan şaşin. Encam gelekin lê çareser nîne. Lewra di warê çarenûsê de derneketine dervayê çarberê. Hemî hewl û lebat di hundirê çarbera heyî de zivirîne. Loma jî riyên çareserîyê nehatine dîtin.

Di gelekan de nîyetên cîbicîkirina nêrînên oryantalî jî hene. Dema ku armanc û xala pêdeçûna ser mijaran evbin encam jî tenê bê çarenûs dimînin û şûna cewherê windayî bê dîtin, nexwestina dîtinê û reva ji kêşeyê hasil dibe. Heta niha hewldanên hatine kirin yan çarenûsên radîkal yên dûrê kêşeyêne yan jî dubarekirinan metodane. Ya girîng jî bêyî avakirin û amadekirina alternatîfê, mandîsîya civakî ya derî rastîya civak û dîroka civakê bi darê zorê xwestine bidin ferzkirin hasil bûne. Di encamê de vana hemî di yek derîyekde derketine û derdikevin.

Axa rojhelata navîn bi xêr û bêre. Axekî bi bereket û ji hêla sîrûştêde jî jibo her cureyê hilberînê guncave. Li kêleka vê rastîyê em qet qala dewlemendîyên wî ya xwezayî wek neft û medenan jî nakin. Di nava dewlemendîyek wiha de civaka rojhelata navîn xîzanî û feqîrîyek mezin dijî. Ewçax pirsgirêk ne di feqîrîya xakîdeye, di pergal û sazûmanîya civakê de ye.

**Divê Şaşîya Bingahîn Bê Dîtin**

Wekî her tiştî di civakê de ev pîvana derbas dibe. Şaşîya destpêkê! An jî şaşîya çêkirina avakirinê!

Yanî xeta di destpêkê de çêbûye û divê sererastkirin jî di wir de bê kirin. Ev der rojhelata navîn e. Cihê destpêka şaristanîya cîhanî ye. Warê avabûn pêşdeçûna herî kevnare. Şanekoka medenî ye. Jêderka hemî şanikên çêbûna ev der e.

Destpêk ev der e. Destpêka avakarîyê, hilberînê, kedîkirinê, rist û temsîla honandina jîyanê, vebêjîya çîrok û sitiranan û çêkirina bawerî û ramanê hemî li vir di hiş û hestê civakê de cîh girtîye û bi cihbûye. Navenda herî kevnare. Qert û seqaye.

Kam û nermahîya xwe a xwezayî bi afirandina hêza îlahî û rûberîya wî bi afirandina destheta yekgirtî winda kirîye. Di gotin û hatina wicûdê a civakê tekamula rûyekî îlahî hatîye neqişkirin. Hêz û hişmendîya îlahî herî kêm deh hezar sal berê li vê axê hatîye kifşkirin û ew hêz di nava reh û rihê civakê de di her warê tekamula zêhn û famayîya civakê de hatîye bicîhkirin. Ev tiştek wihaye ku ji dendikên quantûmê jî biçûktire di rih û hişê û hestên civakê de cih girtîye nayê xuyakirin. Şaşîya destpêkê ewe ku civak bêyî ku li ser esasê pêşdeçûna xwezayî bê avakirin û bi teşekirin, bi mandîsîyekî fikra îlahî dervayî xwezaya civakê avakirin û sazkirina civak û desthelatê hatîye honandin û sazkirin. Ew çax sererastî jî divê di vî warî de bi xebatên aqilane û zanyarî û bi rê û rêbazên maqûl ne şikîner, avaker bê kirin.

**Bandora Hêza Xwedanî**

Wekî me li jor jî got şaşî ne hebûna hêza Xwedayî ye. Ev raman û bawerî di dîroka civaka medenîde her hebûye. Ez ji bo pêşketin û adilbûna mirovahî û civakê tiştekî xeter û şaş jî nîne. Lê şaşî ewe ku ev hêza Xwedayî bi destê mirovan di bin navê Xweda û emrê wî têkilkirina kar û barê beşerîye. Yanî vê hêzê di xizmeta tehakûmkirina hêza xwe de bikarnîn e. Yanî şaşî eve ku ev hêz jibo berjewendî û kontrolkirina civakê û jibo tehkîmkirina desthelata xwe wek navgînekî bikaranîn e.

Kifşkirina hêza Xwedayî jibo rêvebirina civakê û tesîskirina hêza wî li rûyê cîhanê jibo hêza desthelatdar kifşa herî mezin û xurt e. Bi vê kifşê li ser navê xweda gotin gotine û bi van gotinan adeta mejî û zihêna mirovan guherandine. Li ser navê Xweda û di oxira tenzîmkirina desthelatê li ser civakê teşekirina hiş û ramana civakê kifşa duyemîne.

îcatkirina van hukman xala pêdeçûna pêşîne jibo civakê bi gorî hişmendîya xwe bi rêk û pêk bikin.

Wiha gotine: Xwedîyê hemî heyînê yek xwedaye. Her tiştî bi emir û hîdayeta wî hatîye wicûdê û amil bûye. Di civakê de û di jîyan û xulqandinêde tişta bêyî wî ne gengaze. Ew çax di jîn û jîyanê de, di kom û civakê de çi hebe û çi bê kirin divê bi destûr û bi reng û teşmîla wî be. Her tişt divê li gorî daxwaza wî û bi gorî emr û destûra wî be. Ev ferman û kelamên Wî ne. Em jî nûrê wî yên li rûyê axê ne. Ew ji me re dibêje em jî teblîxê we dikin.

Ev destpêka honandina ol û bawerîyêye di hemî kêlî û warê jîyanê de. Xerakirina xwezayîya mirov di vê merhela pêşdeçûna civakê de destpêkir. Ev tewirê famayî û hizirandinê a destpêka mirovahîyê bû. Êdî her tişt bi gorî vê pîvan û yaseyê wicût didît.

Ev famahî bûye bingeha avakirina hişmendîyê, hînbûnê, hizirînê û çêkerîyê. Ev rastî reng û rûyê xwe daye hemî şiklê xebat û pêşveçûna hebûnê di nava civakê de.

Her mirov, her kom û hêz xwe mecbûr û mehkûm his dike ku xwe ne tiştek bihesibîne û çi bike bi hatina wicûda ew hêza gîyanwer û qadir xuyakar bike. Di hemî kar û barê xwe de nîyet û xwestekên xwe de îradeya xwedanî rûnîşan bike. Ev êdî wek kodekî lêvandina tevgera mirovî û wek aplîkadyonekî hişmendî û zekayê di hizirîn û dîtina mirovahîyê de bi cih bû.

Ev yeke ku bawerîya xwedanî û teslîmîyeta beşerî di hemî zihên û gîyana mirovan de wek perçeyek ji hatina wicûdê a wî dibîne û wiha pê bawere. Mirin bi wî hatîye bibîrxistin û pê hatîye famkirin û qebûlkirin ku li vê cîhanê ne ebede û mêvane. Çi bike jibo ew xwedaye. Li vê cîhanê ticar ti zemanekî ne mumkûne ku bikeve hizûra ew xweda. Ev incax li cîhana ebed pêkane û li vir jî încax jibo wê cîhanê emelekî wî yê baş hebe gengaze. Pêkana vê yekê jî jibo ew evd mikafata herî giranbihaye. Ev pê hatîye zanîn famkirin û bicîhkirin. Ji ber vê yekê êdî hemî kar û barê mirov jibo aramî, bextewarî, xweşjîyanîya li ser rûyê vê cîhanê betal bûye. Her mirov bi vê zanînê serwext e ku aramî, bextewarî û şadbûnî li ser rûyê vê cîhanê ne pêwîste. Ya girîng li cîhana wî alîye. Hemî hemd û sena jibo wê cîhanê te kirin. Loma jî li vê xaka rojhelata navîn di binê hişê mirovan de başkirin û xweşkirina jîyana li vê cîhanê nîne. Xwe li vir mêvan dibne û vê cîhanê mekanê riya çûnê dibîne. Loma jî ramana başîyê, ramana abadana jîyanê, aramî û şadîmanî di hişmendîya mirovên rojhelata navîn de nîne. Tenê karê debarkirin û xwarin heye.

Piştî ku hal ev e êdî ti kar û barekî esasî jibo evd li vê cîhanê ne pêwîste. Karekî wî yê esasî berdewamîya kar û barê jîyanî jibo debarê ye û tespîhkirina ew Xwedayê wî ye.

Di virde armanc û mebesta min rakirina raman û bawerîya hêza Xwedayî nîne, bi cîkirina Wî a raste. Li hemî deverên cîhanê di jîn û jîyana hemî milet û civakên cîhanê de ev raman û bawerîya Xwedayî heye. Lê ne wekî ku li vê erdnîgarîyê di hiş û dilê mirovande hatîye bicîkirin bi cih bûye. Wekî vê derê hêza tirsandin, bendkirin û astengkirinê nîne, hêza ramandin û pêşdeçûnêye. Nodla destpêka mirovahîyê de ku pêkdihat, pêktê.

Encama bicîhkirina bawerîya Xwedayî ya bi awayekî şaş hasilkirina civakek ne afirandêr, ne ramanhez û ne pirsîyarker çêkirîye. Ev şeklê famayîyê û hizrê di hemî alîyê jîyan û tevgera mirov û civakê de hakim bûye.

**Dom heye li hejmara bê a Agirî de**

# Şer di pêxema xwe dorandinê de



N. Serbet Urmiye



Di bingeh de, cudahî di pêkhate û sîstemên civakî, çandî, îdeolojî û ... di navbera hêz yan welatên cuda de, sedema derketina şer tê hesibandin. Renge gelek caran jî hevsengî di warên civakî, aborî, sîstema siyasî, hêz û teknolojiya şer di navbera aliyên şer de hebe, wê demê dibe ku faktera îdeolojiya cuda bibe hegera serhildana şer.

Eva hertim ne rast e eva ye ku dawîya şer di serkewtina yek ji aliyên şer de ye. Di rastî de heya ku tev aliyên civakê piştevaniyê ji şer û bikin hêza berdewambûnê jê re dabîn bikin, şer didome.

Wate dom û bidawîhatina şer, girêdayî bi hêza pêkhateyên civakî û aborî yên aliyên şer e, Herçend ku îradeya tex û taqimên cuda yan rêberiya şer jî li ser berdewambûn û serkewtinê di şer be, lê di kiriyar de şiyana pêkhateyên civakê ye ku encama şer dide kifiş kirin.

Eva faktereke eşkere û giştî ye û biha, bawerî û pîvanên civakê bi hev re diwehûne.

Dema ku îdeolojî weke faktera sereke ya seferberiya şer bê zanîn, lawaz bûna wê jî dibe sedem ku çi bandor li ser civakê çinebe.

Vê demê civak rastî qeyrana bîr û baweriyê û bihayên berdewambûnê tê û şer jî hêza xwe ya bingehîn ji dest dide. lewma karnameya(bihêz yan lawaz) a şer ku sedema têkçûn û serkeftina hevsengiyê di civakî deye, biryara şer û aştiyê dide .

Li gorî şiroveya han, mirov dikare heta qasekê encama şerê di navbera rejîma Îslamî ya Îranê û Îsrayilê de bide xuyakirin. Ya ku xuya ye di hemû temenê xwe de rejîma Îranê hertim bagnewaziya nehêştina Îsrayîlê daye û ne tenê mifah ji hêz û teknolijiya şer ya di bin desthilata xwe di Îranê de wergirtiye, belkû teknolojî û hêza xwe ya şerajo bi taqimên şerajo yên destçekiriyên xwe di herêmê de jî bo şer li dijî Îsrayîlê, parvekiriye. Lê heya niha ji bilî ku her carê li cara berê lawaztir derketinê, çi encamek ji rejîmê re çinebûye.

**Ev rastiye nahê veşartin ku rejîma Îslamî ya Îranê ne di ware teknolojiya şer de û ne di ware sîstema siyasî û civakî de, xwediyê çî hevsengiyekê li beramber Îsrayîlê de nine.**

Hewceyî gotinê nine, belgeya dorandina rejîmê di şerê han de, êrîşa bi navê “Bahoza El Eqsa” e. Ya ku di roja 7’ê Oktobera 2023’an a Zayînî de ji aliyê taqima “Ezedîn Qesam” a girêdayî bi rejîma Îrane ve bo ser xelkê sivîl yê Îsrayîlê destpêkir.

Piştî êrîşa han hêza leşkirî ya Îsrayîlê ne tenê li dijî pêkhateyên şerajo yên Felestînê û girêdayî bi rejîma Îranê ve şer berdewam kir, belkû bi eşkere êrîs kire ser bingeh û navendên leşkirî yên rejîmê, him di herêma derdora xwe û him jî di wan rojane de di hundirê Îrane de.

Ji hemûyan girîngtir wêrankirina balyozxaneya Îranê li Şamê(Sûriyê) de bû ku 13 kes ji berpirsên payebilind ên leşkirî yên rejîmê tê de hatin kuştin. Berengariya Îranê di bersiva êrîşa han de eva bû ku pitirî sed mûşekên dûrhavêj û firokeyên bê firokevan, arasteyî Îsrayîlê kirin. Berhema hemû wan mûşekan jî, ji bilî danezanîna bê naverokbûna piropagendeyên rejîmê li dor hêz û teknolojiya serdem a şer, çi tiştek nebû.

Di warê sîstema sîyasî û pêkhateya desthilatdariyê de jî, çi berawirdek di navbera her dû aliyan de nahê kirin ku hevsengiyek di navberê de bide xuyakirin. Pêkhate û sîstema desthilata her du Aliya xuya ye û hewceyê zêde gotine nine(. Helbet eva ne bi vê wateyê ye ku sedî sed alîgirî û piştgiriyê bide sîstema desthilatdariya aliyekê).

Ya ku pitir rejîmê pişta xwe pê ve girêdaye, aliyê îdeolojiyê ye û hewil dide ku di vê rêyê de him alîgirên xwe di meydana şer de ragire û him jî wiha bide xuyakirin ku gel bi giştî alîgirê şerê rejîmê ye li dijî Îsrayîlê.

Weke mînak piştî êrîşên bê encam yen rojên borî, rejîme di ragihandinê xwe de û bi bilavkirina hin dîmenên sextet de, piropagendeya vê çendê dikir ku gel şanaziyê bi hêza leşkirî rêjîmê dike û bi derketina ser şeqaman, cejna serkewtina rêjîmê girtine. Lê di rastî de jî mirov dikare bê esasbûna vê îdeaya rejîmê wiha bide kifşê.

Di aliyê îdeolojiyê ve jî her çend cudahiyeke eşkere di navbera her du aliyan de heye, lê dîsan jî mirov dikare şiroveyeke wiha bide ku bingehên îdeolojiyê di Îsraîlê de heya qaseke zêde giştî ne, wate îdeolojî di navbera gel û desthilatê de hevpar e.

Bo nimûne di dema destpêkirina gerra nû ya şerê Îsrayîlê li dijî taqimên şerajo yên girêdayî bi Îranê ve, nêzîk bi tevahiya pêkhateyên civaka Îsrayîlê derketin meydana şer bo parastina welat û heya niha jî serbarê dana bihayeke zêde, hêj bo serkewtinê şer dikin. Lê di Îranê de îdeolojiya ku bibe bingehê serhildana şer, tenê taybet e bi dem û dezgehên îdarî û siyasî yên ser bi rejîmê.

**Di bûyerên ku heya niha di hundir Îranê de hatine tomarkirin û di herî dawiyê de di şorişa”Jîna”yê de, ev rastî derketin ku îdeolojiya ku heya rejîm li ser bingehê vê hatibû damezirandin û bi hemû terzekê hewil dida bi ser civak û pêkhateyên neteweyî, çandî û civakî yên Îranê de bisepîne, bandoreke wiha di civakê de nedanîne ku îro rejîm weke hêza berdewambûna şer li dijî çî hêzekê bikare mifahê jê wergire.**

Cejin û şahiyên gel, xasma di heyamên rejîmê di leyîzên fotbolê li hember welatên bîhanî de didoraîne, lomekirin û sivik nîşandana rejîmê di hemû aliyan de him li hindur û him jî ber çavê civaka derve, nemaze di wan rojên borî de, nişaneyên netebahiya gel in bi rejîmê re, lewma encama şer xuya ye. Helbet li gor ezmûnên berê yên rejîmê, dibe ku dîsan kasika jehrê were tana rejîmê de.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê kolberek li devera sînorî ya Hewramanê, kuşt

Kolberekî Xelkê Merîwanê li encama teqeya hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê "Tete"yê ser bi Hewramanê, canê xwe ji dest da.



Pêka rapora ajansa "Kurdpa"yê "Roja Çarşemî 29ê Xakelêweyê, Kolberek bi navê "Sîvan Destefken" xelkê gundê "Dere Peme"yê ser bi bajarê Merîwanê, bi sedema teqeya rasterast a hêzên leşkerî yên rêjîma Îranê li sînorê Hewramanê de hate kuştin".

Pêka rapora Kurdpayê, "Sîvan Destefken" bavê zarokekî ye û hêzên çekdare rêjîmê bê agehdarkirina berê û bi awayê rasterast teqe li wî kolberî kirine.

Termê wî kolberî bo nexweşxaneya Merîwanê hatiye veguhastin.

Li vê derheqê li 25ê Xakelêweyê de jî kolberk ê bi navê "Omîd Seîdî" xelkê bajarê Sinê li sînorê "Bestam"ê de li encama teqeya rasterast a hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê canê xwe ji dest da û herwisa li bajarê Serdeştê de jî kolberekî din ê bi navê "Mêhrdad Ebullazade" kurê "Osman" xelkê gundê "Maraxan"ê bi sedema teqeya rasterast a hêzên rêjîmê ji bilindayiyê weresiya û kevte xwarê û canê xwe ji dest da.

## Kolberek bi sedema teqeya hêzên hov ên rêpjîmê ji bilindahiyê berbû û canê xwe ji dest da

Li derdora gundê Bêtoşê ser bi bajarê Serdeştê de kolberek bi sedema teqeya hêzên dije mirov ên rêjîma Îranê ji bilindahiyê berbû û canê xwe ji dest da.



Pêka rapora ajansa "Kurpa"yê, demjimêrên şevê Şemî 25ê Xakelêweyê, kolberekî temen 20 salî yê bi navê "Mêhran Ebdulazade"yê kurê "Osman"ê xelkê gundê "Marxan"ê ser bi bajarê Serdeştê, li encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmî de li bilindahiyên sînorî yên gundê "Bêtoş"ê ser bi bajarê Serdeştê de berbû û canê xwe ji dest da.


Pêka rapora Kurdpayê, wan hêzên sînorî yên rêjîma Îranê, bê agehdarkirina berê li demjimêr 9ê şevê, teqe li girûpeke kolberan kirine.

Pêka gotin Kurdpayê, ew kolberê li encama pêketina gulleyên hêzên sînorî ji bilindahiyê berbûye û demûdest canê xwe ji dest daye.

Pêka amarên Kurdpayê, li heyama 13 salên derbasbûyî de anku 1390-1402, bi gelemper 2 hezar û 463 kolber li Rojhilatê Kurdistanê de hatine kuştin an birîêndarkirin û zêdetir ji %74 a wan haletan li encama teqeya hêzên rêjîêma Îranê de bûye û 64 kes ji wan kolberan, temenê wan jêr 18 salî bûye.

## Rêjîma Îranê cezayê 5 sal girtîgeh bi ser bavê şehîdekî şoreşa Jinayê de sepand

Dadgeha rêjîmê li bajarê Dêwulanê de 5 sal girtîgeh bi ser bavê şehîdekî şoreşa "Jin Jiyan Azadî" yê binavê şehîd "Riza Lotfî" de sepand.



Pêka rapora ajansa "Kurdpa"yê dadgeha înqilab a rêjîma Îranê li bajarê Dêwulanê ser bi parêzgeha Sinê, 5 sal girtîgeh bi ser "Kemal Lotfî" yê bavê şehîd "Riza Lutfî" ku li pêvajoya şoreşa "Jin Jiyan Azadî"yê de ji aliyê rêjîma Îranê ve hatibû şehîdkirin, sepandiye.

Pêka vê raporê, dadgeha rêjîmê bi tuhmeta "çalakî li dijî nizam", yek sal girtîhgeh û tohmeta "bêrêzîkirin bi rêberê Hikûmeta Îranê", 2 sal girtîgeh û bi tohmeta "bêrêzîkirin bi avakerê komara îslamiya Îranê" 2 sal girtîgeh bi ser bavê wî şehîdî de sepandiye ku bi gelember 5 sal girtîgeh e.

Şehîd "Riza Lotfî" yê temen 20 salî û xelkê bajarê Dêwulanê, yek ji yekemîn şehîdên şoreşa "Jîna"yê bû ku li roja 3yê ya şehîdbûna "Jîna Emînî" yê de li 28ê Xermananê de ji aliyê hêzên serkutker ên garda wije ya rêjîmê ve hate şehîdkirin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (468)



# ENFAL

## birînek ku çi caran nacebire

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê
Navenda Ragihandinê